Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal de

Hejmar: 130
6'ê Adara 2010
Buha: 150 Tûmen

# agiri

Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

**Pîroz Be 8'ê Adarê, Roja Cîhanî A Jinan**

8'ê Adarê, roja Cîhanî a Jinan, roja banga azadî û wekheviya li nav civakê de ye. Vê rojê kariye deng û mebesta xwe bighîne çar aliyên cîhanê. Hêviya me ev e ku alaya azadî û yeksaniyê tim hildayî bimîne.

8'ê Adarê li hemû jinên cîhanê, Îran û bi taybet jinên Kurdistanê pîroz be.

Desteya Weşana Agirî

# "Bûna Vê Rejîma Tepeserkar, Bêhurmetî Bi Mirovahiyê Ye"



Komîsera Mafê Mirov a Neteweyên Yekbûyî roja Pêncşemî, 4'ê Adarê, di rûniştina Konseya mafê mirov li Jinêvê de, got: Rewşa mafê mirov li Îranê de xirabtir dibe û ew gelek nigeranê wê rewşa xirab û aloz ya serkuta dijber û neraziyan, destbiser kirina neraziyan, çalakên mafê mirov, rojnamevan û kesatiyên siyasî li Îranê de ye.

Xatûna Pîlay ku rapora rewşa mafê mirov li sala 2009'ê de pêşkêşî civatê dikir, îşare bi serkut û tepeseriya xwenîşanderan li Îranê de kir ku paşan li dadgehên nimayişî de cezayên giran yên îdam û zîndanê bi ser wan de tê sepandin. Herweha daxwaz ji Îranê kir ku izna sefera heyetên navnetewî bi Îranê bo lêkolînên zêdetir bidin.

Li heman hal de, Wezîrê Karê Derve yê Almanê, serbarê rexneyên tund ji pêpeskirina mafê mirov li Îranê de, dijberiya xwe bi egera endametiya Komara Îslamî di Konseya Mafê Mirov a Netewên Yekbûyî de derbirî. Gîdo Wêstirolê, li Jinêvê de ragihand ku cehd û xebatên rejîma Tehranê ji bo endametî li vê Konseyê de, tohîn û bêhurmetî bi hemû wan buhayan e ku ew Şêwre li ser bingeha wê hatiye avakirin.

## Du Îranî Û Pênc Îtalî Bi Tawana Qaçax kirina Çekan Bo Îranê, Hatin Girtin

R: 6



## Rejîma Îranê di Fîlterkirina Malperên Înternetî de Rekorddar e

R: 3



Rûpela 2

Du Pêşmergên PDKÎ Tevlî Karvanê Şehîdan...



Rûpela 3

3'ê Reşemê, Xalek reş li ser eniya rejîmê û rûpelek nû ji xebatê



Selîm Zencîrî

Rûpela 6

Dîdara Dîktatoran



Arîn

Rûpela 8

8'ê Adarê, Roja Navnetewî a jinan



Perî Reşîdiyan

Rûpela 10

Kurte Hevpeyvînek bi hunermendên dengxweş...



Hevpeyvîn: Cefer Mubeşirniya

www.arsivakurd.org

**Di bûyerek tirombêlê de**

# Du Pêşmergên PDKÎ Tevlî Karvanê Şehîdan Bûn

Piştînîvroya roja Pêncşemî, 25'ê Şibata 2010'an(6'ê Reşemeya 1388'ê Rojî), du pêşmergên qehreman, newest û fîdakar yên Partiya me bi navên: Cimşîd Pîrî û Sadiq Reûfî li bûyerek dilêş a tirombêlê de li bajarê Koyê, jiyana xwe ji dest dan û bi yek dunya hêvî û awat ve, xatir û malawayî ji zarokên xwe, hevçeperan û Partiya xebatkar a xwe xwestin û tevlî karvanê şehîdan bûn. Erkê domandina xebata pîroz a xwe jî, ji bo hevrêyên xwe û xortên welatparêz yên Kurdistanê bi cî hiştin.

Her di êvariya wê rojê de, termên wan Şehîdan di goristana Şehîdên PDKÎ bi beşdariya Mistefa Hicrî, endamên rêberî,



Şehîd Cimşîd Pîrî Şehîd Sadiq Reûfî

kadir û pêşmerge, malbatên wan û hejmarekî berbiçav ji endamên partiyê û herwiha malbatên serbilind ên her du şehîdan di rê û resmekî hêja de hatin veşartin.

Paşan seet 10'ê sibêdehiya roja din, 26'ê Şibata 2010, rê û resmek behî û sersaxiyê bi beşdariya Sekreter, endamên rêberiyê, kes û karên wan şehîdan, kadr û pêşmerge û malbatên wan birêve çû. Di despêka wê rê û resmê de, deqîqeyek bê dengî bo rêzgirtin ji canê paqije hemû Şahîdên Kurdistanê, piştre çend ayetek ji Qurana Pîroz hat xwendin. Dûre Mihemed Nezîf Qadirî, endamê Polîtbîroya PDKÎ, bi vê hilkevtê ji aliyê Deftera siyasî ve peyamek pêşkêş kir. Di peyama xwe de, kak Heme Zezîf, "hevxemî û hevderdiya Deftera Siyasî û hevçeperên her du şehîdan, bi malbatên wan re ragihand û serxweşî ji beşdaran, malbatên wan û xelkê welatparêz yê Kurdistanê kir. Herweha rêz ji xebat û tekoşîna wan girt. Li beşek din a peyamê de hatibû ku, ji destdana wan her du pêşmergeyan, xisarek mezin ji bo partiyê, malbatên xwedan qedr yên wan, zarok û hevjînên emegdar yên wan( Xûşke Şanaz Ekberî û Dilniya û Amanc, û herweha xûşke Awat Hesenzade, hevsera şehîd Çiya û xortê şirîn yê wan Aydiya, bûyrek tal, xembar û dilêş e."

"Lê her wek siroştê mirov û ceribîna jiyanê nîşan daye, meznahiya mirov li vê yekê de ye ku li hember bûyerên wiha tal û nexweş de, bi sebr, bêhn fire û ber xwe bide. Lewma çavnihêriya me ji malbatên wan û bi taybet hevserên dilşevitî yên wan ev e ku ew erkê giran yê piştî şehîd bûnê ku dikeve ser milê wan, bi awayekî jêhat û hêja birêve bibin û bibine mînak û berjenga buhayên mirovî derheq zarokên xwe. Bêşik wê fidakariyê em li wan de dibînin".

Paşan Peyama malbatên her du şehîdan, bi nûneratî ji aliyê kak Burhan Ekberî ve hat xwendin.

Herweha pexşanek bi hest li ser şehîd bi navê “Kotira Sipî” ji aliyê kek Kêyhan Yûsifî ve hat Pêşkêş kirin.

Di dawiya wê rê û resmê de, beşdar bûyan behî û serxweşiya xwe pêşkêşî malbatên wan şehîdan kirin û hevxemiya xwe bi wan re ragihandin.

**Kurtiyek ji biyogirafiya wan du şehîdan**

- **Sadiq Reûfî**, naskirî bi Çiya, kurê Mihemed Elî, xelkê gundê Wîzyer a Kamyaranê, sala 1358'ê Rojî li malbatek



welatparêz de ji dayîk bûye.

- Heya pola Du ya Navendî ders xwendiye
- Sala 1380'ê hatiye nav refên PDKÎ
- Sala 1387’ê jiyana hevbeş pêk aniye ku berhema jiyana wan, xortekî bedev û şirîn bi navê Aydiya ye. Heya demên dawîn yên jiyana xwe jî wekî pêşmergeyekê fedakar dirêjî bi xebata xwe nav Partiyê de daye.

**Cimşîd Pîrî**, naskirî bi Hosta Cimşîd, kurê Ebdula, xelkê Kamyaranê, sala 1352'ê Rojî li malbatek welatparêz de hatiye dinê.

- Heya pola Du ya navendî ders xwendiye.
- Sala 1379'ê bi fermî bûye endamê nepenî yê PDKÎ li hundir de
- Sala 1386'ê bi yekcarî hate nav refên PDKÎ û kicên pêşmergatiyê li ber kirin
- Jiyana Hevbeş pêk aniye û xwediyê du zarokên delal bi navên Dilniya û Amanc e

Ruha wan şad û riya wan pir rêvîng be.



# Peyama Deftera Siyasî seba şehîdbûna hejmarek ji Pêşmergên Komeleya Zehmetkêşên Kurdistanê

Birêz Deftera Siyasî a Komeleya Zehmetkêş ên Kurdistanê!

Di gel rêz û silavan.

Heyf û mixabin nûçeya şehîdbûna Komek ji hevalên Komelê, li roja 2’ê Reşemeya sala 1388’ê Rojî, li devera Serdeştê, ji aliyê hêzên dijî gelî yen Komara Îslamî gihîşt destê me. Ev bûyera dilêş jî mîna hemû cinayetên rejîmê dijî xelkê azadîxwaz yên Îranê û gelê niştîmanperwerê kurd, cihê dax û keserê ye. Mirovkujên Komara Îslamî a Îranê jî bi encamdana vê tawana mezin,i rûpeleke pir ji şermezarî û riswayî xistin nav karnameya reşe rejîma xwe.

Deftera Siyasî a Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, tevî mehkûmkirina vê cinayetê, ji Deftera Siyasî a Komeley Zehmetkêşên Kurdistanê, hevsengerên wan şehîdên serbilind, malbatên wan û xelkê azadîxwazên kurdistanê, sersaxî û hevxemiya xwe radigehîne û silavan dişîne bo runa pak yê wan şehîdan û hêvî dixwaze, keç û xortên azadîxwaz yên kurd bi domandina xebata pir ji şanazî a xwe, hêvî û armancên van Şehîdên serbilind û hemî Şehîdên rêya rizgarî û azadiya kurdistanê bi cih bînin.

**Bi spas ve**
**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Deftera Siyasî**

www.arsivakurd.org

# Rejîma Îranê di Fîlterkirina Malperên Înternetî de Rekorddar e

Çar zanîngehên bawerpêkirî ên cîhanê bi navên **Aksford**, **Kambirîc**, **Harward** û **Torinto**, çendîn lêkolîn derheq fîlterkirina malperên înternetî di 40 welatên cîhanê de encam dane, di encama wan lêkolînan de rejîma Îranê weke rekorddarê fîlterkirina malperan hat nasîn.

Di pêvajoya xwenîşandanên heyamek beriya niha li Îranê, ku nûçe û fîlmên wê li seranserê cîhanê de belav bû, rejîma Tehranê bi hewce zanî ku fîlterkirina malperên nûçegihanî, zêdetir bike, Lewra sansorkirina malperan xurttir kir.

Kiryara han, di asta navnetewî de hate mehkûmkirin. Saziya Nûçegihanên bê Sînor, Rejîma Îslamê a Îranê pêşengê fîlterkirina malperên înternetî di asta cîhanê de, da nasandin.

Kongireya Amerîkayê jî, heyamek berî niha gelaleyek pêşkeş kir û sansora înternetî ji aliyê rejêma Tehranê mehkûm kir. Kongireya Amerîkayê xwazyarê piştevanîkirin ji bikarhînerên înternetî di Îranê de ye.

Parlemana Ewrûpayê jî, meha borî di civîna fermî a xwe a li Strasborgê de, bi pejiranidina biryarnemeyek tund, gişt şêwazên fîlterkirin û sansoran, nemaze fîlterkirina înternetî û sansora kanalên esmanî, ji aliyê rejîma Komara Îslamî bi tundî mehkûm kir.

# Komîsyona Siyasî Nîzamî ya PDKÎ, girtina sê endamên Partiyê red kir

Komîsyona Siyasî Nîzamî ya PDKÎ di daxuyaniyekê de girtina endamên Partiyê li sînorê bajarê Serdeşt û Pîranşarê de bi direw derxist.

Deqa wê agehdariya ku ji aliyê nûçegihaniya Kurdistanê ve hatiye şandin bi awayê jêrî ye.

**Agehdarî**

Nûçegihaniya "HARANA" li zarê "Xîbir Tîba", cihgirê ewlekarî û ewlehiya giştî fermanderê sînorê Parêzgeha Azerbaycana Rojava ragihandiye ku di sînorê bajarê Serdeşt û Pîranşarê de sê kes ji endamên PDKÎ ku di sînor de ketibûn hûndira Îranê, girtiye. Bi wî terzî em raya giştî agehdar dikin ew kesên ku hatine girtin, tu peywendiyek wan bi PDKÎ ninin.

**PDKÎ- Komîsyonî Siyasî Nizamî-**
**25' Şibata 2010'a (6'ê Reşemeya 1388'ê Rojî)**

**3'ê Reşemê;**

# Xalek reş li ser eniya rejîmê û rûpelek nû ji xebatê



**Selîm Zencîrî**

Îsal 11'mîn salvegera bûyer û serhildana 3'ê Reşemeya 1377'ê Rojî li bajarê Sine û bîranîna xwîna bi neheq rijyayî a xortên şoreşvan yên wî bajarî bi destê rejîma hov û dijî mirovî a Komara Îslamî ye. Bûyerek ku bûye xal û nuqte guhertinek li dîroka xebata vî gelê mafxwaz de.

Piştî xwenîşandan û dijberiyên kurdan li Parçeyen din yên Kurdistanê derheq girtina Serokê PKK'ê, li Kurdistana Îranê de jî bi heman şêwe xelik bi nîşaneya hevpêwendiya netewî, rijiyane ser şeqam û kolanan û siyaseta dujminkaraneya dagîrkeran û yek ji wan jî Komara teror, tawan û cinayeta Îslamî a Îranê mehkûm û şermezar kirin. Eva jî li demekê de bû ku xelkê Îranê bi giştî û nemaze gelê kurd, Kasika sebra wan ji zulm û bêedaletiya Komara Îslamî tejî û lêwrêj bibû. Her ji delîve û derfetekê digeriyan ku bikarin bi awayekî ektîvtir, serbarê mehkûm kirina rejîmê, daxwaz û xwastekên rewa û berheq yên xwe jî bînin ziman û berevanî û pêdagiriyê ji tevgera rizgarîxwaziya neteweya xwe bikin. Tevgerek ku rejîmê bi hemû hewl, bizav, alav û piropagandayên bi jehr yên xwe, dixwast jinav bibe û li nav gel de jî tu şûnwarekê jê bi cî nehêle.

Lewre hevdem li gel serhildana piraniya bajarên Kurdistana Îranê, rejîmê xwenîşandana bajarê Urmiyê daye ber pêlên tepeseriyê û çendîn lawên wî bajarî li nav xwînê de gewizandin. Lê xwenîşandan her berdewam bûn, heya wê demê ku beşdariya berbiçav a xelkê Sine li roja 3'ê Reşemê de, gihaye kopika xwe û gel bi dirûşmên xwe ve da selimandin ku tevgera gelê kurd, tevgerek zindî û reh û rîşal dakutayî ye. Wê yekê jî tirs û lerz xiste cism û canê lerzok yê desthilatdaran û bûye sedem ku carek din sirişt û adetê hov û Sadîsma Komara Îslamî biazire û bi tundtirîn şêwe bersiva xwast û daxwazên berheq yên wan bide û sîngê xortên şoreşvan yên Sine jî bike armanca gulleyên xwe, ku li encam de 30 kes şehîd, bi dehan kes birîndar û bi sedan kes jî hatin girtin.

Ew serkut û qetlîam li demekê de bûn ku Mihemed Xatemî, rêberê binav Reformxwaz yê Îranê li ser desthilatê bû û bi dirûşmên birisqok yên xwe û demamka demokrasiyê ve, banga reform û rêzgirtina pir rengî a Îranê diqîrand û hewla veşartina rûçikê rastîn yê Komara Îslamî dida. Lê berevaj, wê bûyerê kakil û naveroka rastîn a binav reformxwazan eşkere kir. Herweha selimand ku Komara Îslamî bi hemû mil, band û eniyên xwe ve, yek armanc û yek siyaset li hemberî kurdan de hene.

Ew bûyer zêdebarê vê ku zirar û xisarek pir mezin bû bo kurdan, lê bûye sedema yekêtî, yekrefî û dînamîzma rabûna gel û destpêka qonaxek nû ji xebata gelê kurd ku heya niha jî dom dike û li piraniya bone û hincetên netewî, bi taybet li 22'ê Pûşpera her sal de zêde xwe dide nîşandan.

Niha piştî derbasbûna 11 salan bi ser wê serhildanê de, em dibînin ku rejîma Komara Îslamî li tengasiyek siyasî a dijwar de asî bûye û roj li pey rojê zêdetir dikewe bin givaşan û tê perawêz xistin. Lewre xincî alozî û kirîz afirandin, tepeserî û kuştina xelkê bêzarbûyî yê Îranê, tu tiştek din bo xwe derbas kirin ji vê çal û kirîza ku bi xwe endazyar û mîmarê kulana wê bûye, şik nabe. Li hemberî vê yekê de jî, bûyerên vê dawiyê û bizavên nerazîbûnê yên xelkê Îranê, eyanker û selmînerê vê rastiyê ne ku xelkê Îranê û bi taybet gelê kurd gelek zanatir û hişyartir ji wê hindê ne ku bikewine dafik û telika binav reformxwazên ku heya duh li hemû cinayetên li dijî wan de beşdar bûn û niha jî ji ber qazanc û berjewendiyên banda xwe û rizgar kirina Komara Îslamî, ji hin taktîkan mifahê distînin ku êdî ji xelkê re rohn û eşkere ne. Bi xweşî ve niha gel bi hişyarî ve pêngavan ber bi pêşve hildigre û heman hest, hêz, îrade, viyan, coş û xuroş û xwîn hene û li cismê wan de diherike ku xelkê şoreşvan û ciwanên biemeg û bihest yên Sine li roja 3'ê Reşemeya 1377'ê de hebûn. Wan bi şehîd bûna xwe rûpelek nû ji xebatê vedan û bi xwîna pak a xwe jî, şêne û dara xebata medenî çandin ku niha reh û rîşalên wê, hemû derdora xwe jî dagirtiye û text û bextê dîktatorî û Wilayeta Feqîh xistiye lerzînê.



**Nimûneyek ji xwenîşandana xelkê bajarê Sine**

www.arsivakurdi.org

**RONÎ**

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re



**Ebdulla Hicab**

# Çavên Li Deriya, Xwelî Seriya

Ne ber bi aqilane ye ku tevgera guhertinxwaz li Îranê bi zext û zora dezgehên serkutker bi yekcarî bêdeng bibe û dest ji xebata xwe berde. Lê ev jî xwe xapandin e ku kesek wisan bifikire ev tevger an tevgerek nû ya guhertinxwaz li navxwe an li derveyî Îranê dê bikare di demek kin de sîstema deselatdar biguhere, û piştî guherîna sîstemê bi xwe re hemû pirsgirêkên demokrasî u mafê mirovan li Îranê çareser bike!

Di wê rewşê de pirsên ku dikevin pêşiya tevgera siyasiye Kurd û bersivek zû dixwaz in, gelekin, lê hin pirs bi awayek hê acil xwe nîşan didin û bersivek eşkere dixwazin: Gelo mewdaya navbera me û tevgera hundirî welat çiqas e, daxwazî û hêviyên me ji tevgera navxwe çi ne, û pilana me ya siyasî ji bo pêşeroja welat çi ye û ji bo gihîştina wê armancê, çi pêwîste were kirin? Her yek ji wan çar mijarên bingehîn di qonaxa niha ya xebata siyasî de hewcehiya xwe bi pilansazî û diyarî kirina taktîkên kêrhatî heye. Piştî 30 sal têkoşîna dijwar, opozisyona Îranê, tevgera Kurdistanê jî di nav de, derfeta têkoşîna fermî bi riya kanalên legal re nîne. Şêweya xebata serdema şer êdî niha ne karîgeriya caran heye û ne jî derfeta meşandinê jêre amade ye. Xebata veşartî jî li ber zext û zora hêzên serkutker, bi zehmetiyên zêde re rû bi rû ye û nikare bersiva daxwaziyên civaka têniyê azadiyê bide. Têkilî ji derve re bo navxweyî welat bi dijwariyan re rû bi rû ye. Sîstema autorîter rê nedaye ku mekanîzmên alternatîv bo xebata siyasî bikevin rojevê an metodên nû yên xebatê bi pêş bikevin. Tevgera Kurdistanê bi xwe jî, ji aliyekê ve pirojeyek hevbeşe neteweyî bi pêş nexistiye û ji aliyek din ve jî hê xwe ji zêhniyeta serdema têkoşîna çekdarî xelas nekiriye. Lewma têkoşîna siyasiye hêzên Kurd û bi giştî opozisyona xwedî paşîneya xebatê bi xebta navxweyî welat re ku di çarçoveya mercên heyî de kar dike re hevaheng nîne. Rastiyek eyan e ku piraniya kesayetî û çalakên siyasî ku îro di hundirî welat de ji bo sererastkirinên siyasî xebatê dikin, bijara wan ya yekemîn ne niha û ne pêştir bi daxwazî û bernameya opozisyona rêjîmê re yek nîne û yek nebûye. Piraniya wan kesan hê girêdayî hin pîvan û prensîpan in ku bi xwe bi pîvan û nirxên demokrasî û mafê mirovan, weke me bawerî pê heyî re hev nagrin. Lê di heman demê de civaka medenî û neteweyên bê maf hene ku ji ber mercên jiyanê îmkannîn in bi daxwaziya xwe riya xebatê an aliyê siyasî hilbijêrin. Di gel ku piraniya wan bi opozisyonê re bin, lê nikarin bi eşkere beşdarî xebatê bibin. Ji ber wê yekê dema îro derfetek kin li pêşiya xwe dibînin, wan ala û duruşmeyan hil didin ku derfeta gotin û hildana wan heye, lê di heman demê de jî nîşan didin ku ev nerazîne. Dema hin kesayetiyên nû riya xwe ji ya sîstemê vediqetînin u taze hest dikin ku çarçoveya sîstema Komara Îslamî hin qas teng e ku tenê bi kêrî binajo, tundajo û paşveroyan tê, tiştek xwezayî ye ku gel bersingê xwe ji wan re veke.

Her çend bi sinûr kirina deselata hin kes û dezgehên zêde dij demokrasiyê bi xwe karek erênî ye, lê ji bo sererast kirinên siyasî têr nake. Ber wê yekê mewdaya navbera tevgera siyasiye neteweyên li derveyî bazneya deselatê û xebata ji bo bi cîh kirina xal û birgehên yasya giştiye îro pir zêde ye. Ya rast hemû hêvî û daxwaziyên tevgera siyasiye Kurd an hêviyên neteweyên li derveyî bazneya deselata siyasî li Îranê, bi daxwazî û bernameya siyasiye tevgera nû re yek nînin. Lê di hin milan de aliyên wekhev xuya ne û dikarin werin xurt kirin û bi hev re bêne hevaheng kirin. Ji ber wê yekê her çend Kurd û neteweyên din di wê tevgerê de beşdar bin, lê dîsan bi pêş xistina daxwazî û dengvedana hêviyên neteweyên dûrî deselatê di nava tevgera nû de pir giring e.

Tevger an tevgerên navxweyî welat ji bo ku bikarin pitir derfeta xwenîşandan û xwe xurt kirinê bi dest bixin, dikarin û pêwîste zêde hevahengiyê bikin. Di heman demê de jî dikarin bi daxwazî û bernameya xwe û bi merc hin pêgavên hevbeş jî bavêjin.

Lê tevgera Kurd pêwîste ji danîna bernameya çalakiyan ji bo tevgera hundir, pilanek stratejîk ji bo pêşeroja Îranê jî eşkere bike. Tenê hewl dan ji bo bi pêşxistina ruhê berxwedan û serhildanê têr nake. Ev jî ne bese ku em bêjin pêşeroja gelên Îranê bi guhertina rêjîmê û bi demokrasiyê ve girêdayî ye. Hem şêweyên cuda yên guhertinê hene û hem modelên cihêrenge demokrasiyê. Ji wê jî bi der, têgeha demokrasiyê bi xwe gotinek zêhnî an subjektîv e ku zehmete her demê bi yek pîvanê were nirxandin. Di hin şêweyên demokrasiyê de hilbijartin jî ku bi xwe bingeha sereke ya sîstemê ye, xirab tê bikar anîn. Lewma tenê bas kirin ji demokrasî, ya heta bas kirin ji sekolarîzm û guhertina rêjîmê nikare bi xwe zemanetê bide gelê Kurd ku wê bikare li pêşerojê di pêvajoya siyasiye welat de xwedî biryar be.



Di wê rewşê de pêwîstiya tevgera Kurdistanê bi pilansaziyek nû ya siyasî heye ku xwedî hin karakterên bingehîn be

**1:** Nasnameya netewiye Kurd weke nasnameya sereke biparêze û hemû nasnameyên din weke nasnameyên lawekî ku di encama pirojeyên siyasî de û bi lihevhatinê pêk tên pênase bike

**2:** Bi siyaseta yek partiyê ve girêdayî nebe

**3:** Reng u cewherê neteweyî pêve diyar be

**4:** xwe ji îdeolojî an rêbazek tenge hizrî biparêze

**5:** pîvanên mafên mirovan, mafê tak jî di nav de, ji xwe re bingeh bigre.

**6:** kêmasiyên ku ji ber rewşa siyasî di civaka Kurdistanê de reh girtine, weke rewşa mafê jinê, rewşa tak û hurmeta îradeya kesan u gruppan bibîne û rêçareyan jêre pêş bixe.

**7:** Kermaeta tak weke bingeh ji bo bi pêş xistina hurmeta dualî biparêze û di xebata xwe de wê yekê bi bingeh bigre.

Ji bo bipêşxistina pilanek siyasî li ser bingeha pîvanên ku li jor hatin rêz kirin, pêwîstiyek acil û bi pilatformek hevbeşa siyasî bi beşdariya hemû hêzên pêkhînerên tevgera Kurd heye. Eger ev pêwîstî neyê dîtin û ji bo li hev hatinek neteweyî pêgavên bilez neyên rakirin, dubare çavê me wê her li rê be ka kengê deriyek vebe. Bê guman, deriyê ku bi îradeya Kurdan bi xwe venebe, tu gav nikare derfetek siyasî ji gelê Kurd re pêk bîne ku bibe hegerê çareseriya meseleya neteweyî.

Êdî niha pirsa sereke ev e ka gelo tevgera siyasiye Kurd li Rojhilata Kurdistanê amade ye li gor her yek ji wan hewcehiyên ku li jor hatin rêz kirin, bersivê bibîne? Eger ne wisa be û gera li pey rêçareyan ji niha ve destpê neke, siberoj wê pir dereng be. Eger pêşengên siyasiye Kurd li bendê bin ku tevgera navxwe an jî bizevek ji derve re hin guhertinan pêk bîne an zemineya beşdariyê ji wan re amade bike, wê demê gotina bab û kalan wê bersiva herî baş be; "çavên li deriya xwelî seriya!"

www.arsivakurd.org

# Hêza herî zêde bo Tevgera Sivîl



**Azad Kurdî**

Di xebat û tekoşîna hemû neteweyên bindest ji bo bidestveanîna azadî, demokrasî û mafê neteweyî de, sîstema siyasî a desthilatdar û qanûnên wê hikûmetê diyar dikin ku tevgera siyasî – sivîl çi stratejî û taktîkan bo dabînkirina xwestekên xwe ên siyasî, sivîl, civakî û wd di xebatê de bimeşîne û tevgera xwe pêşde bixe.

Xebata sivîl proseyek e bo gihîştin bi daxwaziyên sivîl û demokratîk û hewldan ji bo parastina wan mafan di civakê de. Piraniya tevgerên sivîl ên cîhanê xebata xwe bi awayekî aştîxwazane û dûrî tund û tûjiyê meşandine, lê di welatên dîktator de xebata sivîl bi dijkiryarên dewletan re rûbirû dibin û tundûtûjiyê li dijî çalakvanên sivîl dimeşînin. Bikaranîna metodên nû ên xebata sivîl yên bê tundûtîj û aştîxwazane li kêleka rêbazên kevin ji aliyê tevgerên civakî – siyasî li Ewrûpaya Rojhilat, Komarên Asya Navîn ku piştî hilweşandina Yekîtiya Soveta berê hatin avakirin û heta li Amerîka, karîn serkeftin û destkevtên pirr mezin bo vê tevgerê bidest bixin.

Di zanista siyasî de jî, gelek şêwazên xebata sivîl hatine destnîşankirin ku her yek ji wan dikare di her welat û civakekê de were bikaranîn û bandora xwe jî bilîze. Gelek awa û rêbazên xebata sivîl hene ku li gor sîstem û rewşa siyasî û civakî ya her welatekê tên bikaranîn. Lê xwenîşandan û kombûnên nerazîbûnê awayekî herî sereke ye ku xelkek zêde ji bo armanceke sivîl a diyarîkirî li dora hev dicive. Hewcehiya sereke ya vê cure xebatê, hebûna civaka sivîl e ku divê sîstem pêk bîne û mafên medenî, senfî û pîşeyî ên welatiyan berçav bigre û wan mafan binpê neke.

Xebat û çalakiyên sivîl di civakê de li gor sîstema siyasî ya welat tên organîzekirin û rêbaz û armancên wan ji welatekê bo welateke din cuda ye. Lê bi giştî, xebata sivîl ji ber taybetmendiyên xwe yên erênî, dikare roleke bi bandortir di civakê de bilîze û armanc jî zûtir û hêsantir misoger dibin.

Lê di welatekê de ku sîstema wê ya dadê qanûnan neparêze, maf û azadiyên welatiyan berçav negire, ne tenê bê fermaniya sivîl nikare bê pêşbînîkirin, belku mafê nerazîbûn di çaçrova qanûnê de jî dibe sedema ceza, tawan û tometên giran ji aliyê desthilatê. Bo nimûne riftara Komara Îslamî ya Îranê ligel çalakvanên sivîl li Îranê, bi taybet li Kurdistanê. Ji ber ku her cure meş û nerazîbûneke sivîl li Îranê ligel lêdan, bêhumetî, girtin, kuştin û îdamkirina xelkê nerazî rûbirû dibe. Riftara tundûtûj a hêzên Komara Îslamî ligel xelkê nerazî bi encama gera dehem a hilbijartina Serkomariyê dikare mînaka herî dawî be. Yan mirov dikare pêla berfireh û bêrawestan a girtin, lidarvekirin û cezayên giran ên girtîgehê bo çalakvanên sivîl û mafê mirovan li Rojhilatê Kurdistanê wek mînaka gellek berçav bide xuyakirin.

Dibe ji ber vê sedemê be ku gelek fîlesofên siyasî wek Can Ralz, Hana Arent û Habermars tekezê dikin ku xebata sivîl, tenê ji bo rewşeke taybet ji civakeke demokratîk û nîv dadmend tê rojevê. Lewra hikûmetek wek Komara Îslamî ku ji xebata sivîl a welatiyên xwe ditirse û bi awayekî pir tundûtûj bi wan re tevdigere, ne demokratîk bûn û ne adîlanebûna xwe derdixe holê. Her wek Habermars dibêje: "Reaksyon li hember xebata sivîl a welatiyan, ceribandina fehmkirin ji sîstemeke xelk serdest e."

Bi giştî di prosa xebata sivîl de ku çend sal e li sernanserê Îranê, bi taybet li Rojhilatê Kurdistanê destpê kiriye, armanc di çarçova bidestveanîna maf û azadiyên sivîl û welatîbûnê û cihgirkirina demokrasî û azadiyên demokratîk û nemaze parastina mafê mirovan de tên meşandin.

Tevgera sivîl li Îranê ligel pirr astengên cidî rûbirû ye û bersiva çalakiyên sivîl û aştîxwazane bi tundûtûjiyên dijwar tên bersivdan. Komara Îslamî bi hemû alav û amûrên leşkerî, medya û hêzên çekdar ên qirkirin, derheqê vê tevgera sivîl a destvala û aştîxwazane ya xelkê nayê. Lê xelkê Îranê bi giştî, nemaze netewa Kurd, bi nasîna naverok û cewhera rastîn a Komara Îslamî, dest bi xebata sivîl kirine û roj bi roj qada wê xebatê



berfirehtir dibe. Her çiqas di welatek wek îranê de xebata sivîl jî bi qasî xwe bedel hene û berdewam goriyan digire, lê xelk ji wan bedel û nirxdayînan natirse û çalakiyên sivîl li sernaserê Îranê roj bi roj xurttir dibin, bi taybet li Kurdistanê xîmê xwe bi tevahî dakutaye. Lê di hikûmetên dîktator û serkutker de, bêfermanîkirina sivîl li hember sîstemê di warê siyasî, abûrî, civakî û kultûrî dikare awayên baş bin ku nirxdayîn kêmtir be. Rêbazek ku ji berê ve Kurd bi başî meşandine û niha jî tê rêvebirin. Ger mirov bi hûrî lê binêre, li Rojhilatê Kurdistanê bi salan e baykuta li ser desthilatê di her warekê de tê xuyakirin, ev tevgeriyana xelkê ku her tiştek dewletê bixwaze, gel berevajî wê tevbigere û baykut bike, bi xwe curek ji xebata sivîl tê hesibandin.

Gelek taybetmendî hene ku dikarin çalakiyên sivîl yên xelkê pêşde bibin, lê giştîbûn û berfirehbûna têkoşîna sivîl dikare fakterek bibandor be bo pêşdeçûna xebatê û dabînbûna aramncê wê xebata hêja. Di vê derbarê de organîzekirin û rêxistina tevgerê pirr giring e.

Eger li Rojhilatê Kurdistanê partî û rêxistinên siyasî xebat ji bo azadî, demokrasî û mafê neteweyî dimeşînin, lê avakirian NGO, sazî û komeleyên sivîl, civakî, çandî, hunerî û wd li hundirê welat û çalakiyên wan yên sivîl û aştîxwazane û dûrî tundûtûjiyê, dikare ji bo pêşdeçûna xebata sivîl li Rojhilatê Kurdistanê gelek bibandor be. Rêbazek ku niha ligel hemû astengî, dijwarî û bêedaltiyeke hiqûqî û dadê li Îranê, gelê Kurd destpê kiriye. Bi terxankirina hêza herî zêde bo xebat û çalakiyên sivîl, bêguman civakeke bihêz a sivîl li Kurdistanê çêdibe û dikare bibe bersivderê dîktatoriyetê û binpêkirina mafê xelkê.

## Zext û givaşên parastina Zanîngeha bajarê Urmiyê bo ser xwendekar û karmendên kurd

çend xwendekarên kurd ên zanîngeha Nazlû Azad, peyama Nûr û Xeyre Întifaî ya bajarê Urmiyê ku di Roja Cîhanî ya Zimanê Zikmakî de, bi Kincên kurdî çûne ser kilasên xwendinê, bo parastina wan zanîngehên navhatî hatine gazîkirin.

Nûçegihaniya kurdistanê di vê derbarê de ragihand, parastina zanîngehên navhatî bi karmendên Kurd ragihandine ku nabe digel xwendekarên Kurd de bi zimanê Kurdî bipeyvin. Heke ne, dê li ser karê xwe werin derkirin.

www.arsivakurd.org

## Desttêwerdanên Komara Îslamî li karûbarên Îraqê hevdem li gel Nizîkbûna Hilbijartinên Parlimanî

Nûrî Malikî di berebere hilbijartinên Îraqê de, hevwelatiyên rikeber ên xwe bi pere wergirtin ji hêzên biyanî tometbar dike. Li gor rapora BBC, ev axaftinên Malikî di demekê de ye ku komek ji saziyên siyasî navhatî tawanbar bi girêdayî bûn bi Komara Îslamî re dikin. Mideheke berî niha Kirîstofêr Hêl, balyozê Amerîkayê li Îraqê gotibû: Îran xwediyê berjewendiyên neyarane ye li Îraqê de, ku Malikî di hevpevîna bi BBC a Erebî de berevanî li Îranê kir û ew tawan jî red kirin. Bi taybet niha li ser û bendê hilbijartina Parlimanî a Îraqê, Îran hemû hewla xwe dide ku lobiya xwe bihêz bike û ji hêla din jî nearamî û aloziyan pêk bîne.

## Deverek Bajarê Makoyê Hat Topbarankirin

Heyamek berî niha, hêzên Sipaha Pasdaran ên rejîma Îslamî a Îranê, devera Kire ya bajarê Mako topbarankirin.

Nûçegihaniya Kurdistanê di vê derbarê de ragihand, hêzên Sipaha Pasdaran ên rejîma Îranê diwxazin binkeyeke leşkerî di vê deverê de vekin. Wan hêzan bi şev û bi rojan bêy hebûna biryara dedgehê, êrîşê dikin ser malên xelkê wê deverê û malên wan digerrin. Hêjayî gotinê ye ku hêzên Sipaha Pasdaran ên Îranê dixwazin bi wan kiryarên xwe xelkê vê deverê çavtirsîn bikin, lê ew kiryara hêzên rejîmê bûye sedema bêzarî û tevlihevkirina jiyana xelkê wê deverê.

## Zext û givaşên hêzên rejîmê bo ser xelkê gundên Urmiyê zêde bûye

Di midehê çend rojên borî de, zext û givaş û gefên hêzên Komara Îslamî bo ser xelkê gundên, Berdekeşk, Qamîşlû, Nenas, Naznaz, Zêwe, Nasirava û Delo Derbend a bajarê Urmiyê zêde bûye.

Nûçegihaniya Kurdistanê di vê derbarê de ragihand, berpirsê binkeya Reşekanê bi şandina nameyekî fermî, xelkê wan gundan haydar kiriye ku bi zûtirîn dem serdana wê binkeyê bikin û berpirsên peywendîdar xatircem bikin ku tu terze têkeliyek bi PDKÎ ve ninin û dibe wan li her terze çalakî û piropaganda yên endam û alîgirên PDKÎ haydar bikin û eger rêveberên wan çalakiyan bi berpirsên peywendîdar nedin naskirin, wê demê bi tometa hevkarî digel PDKÎ dê bihên ceza kirin.

Li gor wê çavkaniyê heta niha gelek kesan serdana wê binkeya rejîmê kiriye û bi neçarî formek ji wajo kiriye ku rejîm li gor wê yekê dikare di pêşerojê di organên tepeserker de bi dadgehê re berbirû bikin.

Herwiha berpirsê hêzên tepeserker ên rejîmê di Reşekanê daxwaza kopiya nasname û cihê akincî bûna tewahiya endamên wê malbatê kiriye ku di midehê çend rojên borî de serdan wê binkeyê kiriye.

Rojev

# Dîdara Dîktatoran

**Arîn**


Tenê rojek piştî wê ku Hîlarî Kilînton, Wezîra Karê Derve ya Amerîkayê nîgeraniya xwe derheq pêwendiyên Îran bi Sûriyayê re derbirî, Ehmedînejad li ser deiweta fermî gihîşte Sûriyê û bi hevtayê xwe, Beşar Esed re civiya. Herweha bi cuda, dîdar û hevdîtin bi girûp û rêxistinên terorîstî û dijberên aştiya Rojhilata Navîn re pêk anî û weke sê aliyên berxwedanê, peyamek hevbeş dan neyarên xwe û gerku bixwaze vê carê gefan bixwe yan şaşiyek din dubare bike, dê vê carê bi tewahî jiholê rabe. Bi watayek din mirina yekcarî.

Eve jî li halekê de ye ku Amerîka, Ewropa û Îsraîl wan girûp û rêxistinan bi terorîst, herweha Îran û Sûriyayê jî bi piştevanê terorîzmê tawanbar dikin. Dîdara dîktatoran li demekê de ye ku ji aliyekê ve hewl û bizav, ji aliyê dinê ve jî zext û givaşên navnetewî û bi taybet Amerîkayê li ser Sûriyê xurt bûne bona wê ku bikarin ji Îranê dûr bixin. Em dibînin ku her yek ji Amerîka, Erebistana Seûdî û Ewropa siyasetek nermtir û rûpelek nû ji pêwendiyan bi Sûriyê re vekirine.

Nemaze Amerîka piştî 5 salan bi ser teror kirina Refîq Herîrî û vekişandina balyozê xwe ji wî welatî bi nîşaneya nerazîbûn li hemberî desthebûna li terorê de, niha ser ji nû ve dîplomatek payebilind yê xwe (Rabirt Ford), bi fermî wekî balyoz bi wî welatî da nasandin. Ku eva jî derfetek e li pêşberî rayedarên Sûriyê de ku çawan bikarin mifahê jê bistînin û li nav hevkêşeyên siyasî yên deverî û cîhanî de jî rola xwe bilîzin.

Li vê navberê de herçiqas ku rewşa siyasî ya Îranê, him li navxwe û him jî li derve de gelek aloz, şepirze û rastî tengasiyek bêwêne hatiye, û girovera dorpêç û givaşên cîhanî jî roj li pey rojê li dijî, tengtir dibe û pêtir dikeve perawêzê, lê dîsan bi rewşa siyasî a Sûriyayê re ferqek zaf heye. Lewma li vê derheqê de desthilatdarên Îranê ketine ser dest û lepa û dixwazin bi her nirx û qîmetekê be, pêwendiyên xwe bi take hevalbendê ereb yê xwe re biparêzin û heya radeyekê xwe ji kirîza dîplomasiyê rizgar bikin. Serbarê wê ku her du welat li çend xal û fakterên hevbeş de girêdayî hev in û divêt qazanc û berjewendiyên hev berçav bigrin. Yan bi awayekî din, ew fakterên hevbeş, wan neçar dike ku li kêlega hev de bimînin:

Bûna hevalbendiyek kevnar, bûna sîstemên desthilatdariya dîktatorî û nedemokratîk, piştevaniya terorîzmê, desttêwerda li kar û barên welatan de, hewildan bo bidestxistina çekên komkoj, dijîberiya bi prosesa aştiya Rojhilata Navîn,



herweha her du jî ketine ber tehrîmên Amerîka û hw.

Lê ev sefera du rojî ya Ehmedînejad li vê zirûfa hesas û hestiyar de bi giştî dikare çend armancên sereke şopandibin:

- Nûkirina peyman û hevalbendiya bi hevre û xwe berhev kirin bona ber bi rû bûna bi her êrîşekê re
- Pêşkêşkirina hevkariyên madî û menewî bi girûpên terorîstî weke Hizbula, Hemas û ... herweha destxweşî kirin ji wan bona beşdarî kirin li tepeserkirina nerazî û dijberan li Îranê de û haydana wan bo berdewamiya vê pêvajoyê li pêşerojê de.
- Afirandina şer û aloziyek nû û teyîsandina şerek din li deverê, bona berxwar kirin û bi larêde birina raya giştî ji rewşa siyasî a hudir, pêpes kirina zêdetir a mafê mirov û tepeser kirin û temirandina bizavên nerazîbûnê li gor dilê xwe û bi dûr ji raya giştî.
- Bi vê çendê jî demek din bo xebatên navikî yên xwe bidest bixîne
- Herweha bi wan gef û guran, cîhanê ji sepandina ceza û hisarên pêtir bo ser xwe dudil û poşman bike

Armancek din ku bûye beşek neveqetiyayî ji siyaseta derve ya Komara Îslamî, şandina tovê şîe geriyê bo cîhana Sunniyan e. Bê şik di vê seferê de, xebata di vê çarçoveyê de jî ji xwe re hêsantir û bi tesîrtir kir. Ew jî bi hilgirtina Vîza û belgeyên hat û çûnê bo hevwelatiyên her du aliyan. Çunku her sal bi hezaran Îranî bo ziyaret û dîtina navendên mesebî sefera Sûriyê dikin ku çavkaniyek baş ya dahatê bo Sûriyayê jî tê hesibansin. Xêncî wê jî Komara Îslamî di çarçoveya karê nûjenkirin û xemlandina wan navendên mesebî de, armananca sereke ya xwe ku şîe gerî ye, bi nîşange digre.

Serbarê vana, vê gavê Sûriya ji her du aliyan dixwe, lê wekî xuya carê qazanc û berjewendiyên xwe li rex Îranê de dibîne. Lê hevalbendiya wan dê çiqas dewamê bîne? Yan kengê Sûriya dê bikare dev ji Îranê berde û tevlî civaka cîhanî bibe? Pirsiyarek e ku girêdayî bi parseng û terazûya nirx û poanên her du aliyan bo Sûriyê li pêşerojê de heye.

**Şanaziyek Din Ji Bo Rejîma Îranê,**

# Temenê Xwefiroşiyê daket 10 Saliyê



Civaknas û mamostayekî zanîngehê, di hevpeyvîneke de tevî nûçegihanê “Farda”yê, ragihand: Di Îranê de diyardeya jinên ser şeqaman ber bi zêdebûnê diçe, encama lêkolînan derdixe ku temenê xwefiroşiyê, daketiye 10 saliyê û pirraniya xwefiroşan, ew keçên ciwan in, ku teze tevlî vî karî dibin.

Dr. Emanulah Qerayî moqedem, derheq derketin û belavbûna sedemên xwefiroşiyê di welat de dibêje: Girîngtirîn sedema derketina diyardeya han hejarî û, bêşiyan bûna jinan e di dabînkirina bijîva jiyanê. Navbirî herwiha serhildana diyardeya jinên ser şeqaman vedigerîne bo telaq û bê serberiya malbatan, Koçkirin, nexwendewarî, neagahî û îtiyad û helatina keç û jinan ji malbatê xwe. Sedema herî girîng a helatina wan keç û jinan jî, alozbûna bingeha malbatê ye û ev aloziya jî tenê di warê aborî de nîne. Wî herwiha eşkere kir ku tu sazî û navendek di welat de tune ku bikaribe bi terzek rêk û pêk û dirust lêkolînê li ser pirsên jinên ser şeqaman bike, lewra tu serhejmariyek rast û cihê baweriyê bona çareseriya pirsa han nîne. Di halekê de ku diyardeya jinên ser şeqaman, yek ji xesarên girîng ên civakî ye.


Li gorî vê çavkaniyê ji her 6 malbatan, yek tûşî cudabûnê dibe ku eva jî dibe sedema qutbûna çavkaniya dahata wan û rêxweş bûn bo vî karî.

Seba nebûna serhejmariyek rast, piraniya terhên ku ji aliyê saziya “Bihzîstî” ve derheq rêxistina jinên ser şeqaman beriya niha hatibûn pêşkêşkirin, seba nepejirandina wan ji aliyê civak û berpirsan ve, tûşî şikistê hatin û neketin qonaxa cîbicîkirinê.

Lewma diyardeya han serbarê xurtbûne, gelek nesaxiyên weke îdzê jî zêde kirine.

# Terha Xanenişîn kirina Gişt Jinan Di Rejîma Îranê De

**“Birêveberiya jinan di civakê de, hizrek Rojavayî ye ku dize kiriye bo nava Îranê”**



Endama Komîteya birêveberî a Navenda Karûbarên jinan got: Nabe beşdariya jinan di astên birêveberî de bibe bingeha xurtbûn û pêşkevtina welatê me. Çimku Rojava ev baweriya afirandiye ku dibêje pêşketina welat, girêdayî beşdariya jinên birêveber di asta civakî de ye.

Pêka rapora nûçegihaniya “Mêhr”ê, **Zehra Şerefedîn**, di civîna rênimayîkirina komîteya lidarxistina rê û resma rêzgirtin ji kesayetiya jin û dayîkê, tevî îlankirina vê mijarê, got: Bona berbirûbûn û berevanîkirin li hember hizra Rojavayê, çawa wan birêveberiya jinan di civakê de cihgir kiriye, divê em jî birêveberiya jinan di mal û malbatê de cihgir bikin û çanda han bişînine cîhanê.

Wê tevî tekezkirin li ser vê yekê ku nabe jin tenê di çarçoveya birêveberiya civakî de were nasandin, got: Divê em jina maldar weke sermeşq û nimûne bidin nasîn û wan bo civînên siyaset darêjiyê gazî bikin û wan di birêveberiya mal û malbatê de bihêz bikin.

Zehra Şerefedîn, sedema jordeçûna asta cudabûn û jihev veqetiyana di civakê de vegerande ser berçavnegirtina hîcaba Îslamî ji aliyê jinan, îxanetkirina wan bi hevjînên xwe û şandina peyaman ji rêya mobaylan bo hevkarên xwe ên mêr re.

# Rewşengerî Û Tepeserî

Bikaranîna serbixweyî a têgihîştinê bi awayek eşkere yan jî balixbûna eqil, Pênaseya"Amanoêl Kant, "fîlsofê binav û deng ê Almanî ye li ser rewşengeriyê. Eger em vê pênasê bikin bingeh û bi wê dîtinê li xelkê Îranê bifikirin, ev yeke piştrast dibe ku nerazîbûnên wê dawiyê ên xelkê Îranê, berhema gihîştina wî xelkî bitaybet ciwanan bi qonaxa rewşengeriyê ye.

Eger mirov çavek li derbazbûyî a kurta vê bizava nerazîbûnê bike, derdikeve ku qonaxa despêka wê, bi xwastikên sereke, weke peydakirina deriyekê, bikar anîn û zû li wê qûnaxê derbazbûn û gihîştin bikaranîna serbixweyî a têgihîştina xwe ku radîkaltirbûna dirûşman,mînakek zîndî bo vê yekê ye. Her eva ku di midehê30salan de,beşek zaf ji xelkê Îranê dijberî bi awayek veşartî di xwe de diperwerandin û di dawiyê de tex û qtên curbicur ên xelkê tevlî refa wî xelkê bûn û bi awayek eşkere di dirûşman de xwestikên xwe dixin ber çavên cihan û desthilata hakim di Îranê de.

Ewa ku xelk di dirûman de dixwaze ev e ku bila kes şîweya jiyanê ji me re hilnebijêre, kes bi nûneratiya Xedê hizrên xwe bi navê ayîn û şerîet bi ser me de nesepîne û girtin û kuştina cudabîran bi dawî bê... Evane hin mesele ne ku bi bawera xelkê di çarçoveya serbestiya wan de nehîştine û weke mafek şiroştî yê wan ji aliyê desthilatê ve hatine zewtkirin û hin kesên din li cihê wan difikrin.

Dema ku ew karê han givaş û bê edaletî gihand ser hestiyên xelkê û tu rê ji bo bikaranîna hizrên serdemiyane neman, ew wêrekiya ku rewşengerî pê tê naskirin, ji aliyê xelkê ve tê bikaranîn di pêxema wê yekê ku ger ew pêvajoya han berdewam be, arasteya wê dê ber bi çi tarîtiyekê ve biçe. Lewre di vê riyê de xwîna xwe dirêjin ku ew jî hebûna wêrekî û nîşandana hişyarî û têgihîştina serbixwe ya wan ji bo diyarîkirina sîstemek dilxwaz a desthihatdariyê bikar tînin.

Lê bi hebûna rejîmek wiha ku rewşengeriya bi pênaseya Kant, bi têkdana ewlehiya welat û gunehbar kirina ciwanan bi kopalbidestiya welatên biyanî dihesibandin, vê yekê piştrast dike ku melayên tarîperest yên deshelatdar di Îranê de welat, xelk, çand, abûrî û hemû madiyat û manewiyatekê di çarçoveya têgihîştina paremayî a xwe de dibînin. Ligor pênaseya Kant, desthilata ku bibe sedema pêşgîrî ji balixbûna eqilê tak û civakê, ew bi xwe jî di eqlek nebalixbûyî de dijî.Y yan jî li vî warî de têgihîştin hene, lê balixbûna têgihîştinê bi xeterek li ser desthilata xwe dizane.

Di demek wiha de mirov dikare bêje ku desthilatdariya Îranê di hizrek nebalixbûyî a sedsalên navîn de desthilata xwe li ser hizra pêgehiştî û serdemiyane “balixbûyî” a xelkê Îranê de dimeşîne. Nimûne girtîgehên tejî rojnamevan û rewşenbîr û bîrmendan in.

**c_m_s24@yahoo.com**

www.ersivakurd.org

# 8'ê Adarê, Roja Navnetewî a jinan



**Perî Reşîdiyan**

Li dîroka mirovahiyê de em rojên girîng û taybetî dibînin. Hamû netew û walat jî xwedî rojên birûmet û xasmanî ne. Li vê navberê de hin roj li cîhanê de hene ku rojên nevnetewî ne. Hemû cîhan xwe li wan rojane de beşdar dibînin û hesta nêzîkatî û yekêtiya bihevre dikin. Roja 8'ê Adarê jî, yêk ji wan rojên pir girîng li dîroka jinan deye ku hemû jinên cîhanê nêzîkî hev dike.

Pirsa jinan jî pirsek siyasî, civakî, abûrî û mirovî ye. Jinên cîhanê hemû ev pirsene zêde yan kêm ceribandine û pêre jiyane û dijîn. Jinên cîhanê hemû ew êş û azarên ku derheq bi jinan têne kirin, hîs dikin û li eşa wan de xwe beşdar dibînin. Niha sedsalek û nîv e ku li ser bûyera nexweşa New Yorkê re derbas dibe. Li sala 1857'an de jinên kedkar ên fabrîkeya ristin û raçandina bajarê "New Yorkê" bi armanca zêdekirina miaşê xwe û kêm kirina dema kar, meşek lidarxistin, lê belê ew meş, ji aliyê polisan ve hate tepeserkirin û çendîn jinan canê xwe ji dest dan. Dîroka 8'ê Adarê vedigere bo wê bûyera nexweş ku li New Yorkê de rûda. Li sala 1975'ê, ev roje wekî rojeke navnetewî ji aliyê Netewên Yekbûyî ve hate diyarîkirin. Hemû jinên cîhanê para xwe li wê roja dîrûkî de hene. Ew roj, diroşim, ala û dengê hemû jinan e li dijî bêmafî, zulm û tund û tûjiyê. Ew xebata li her derên cîhanê berdewam e. Li hin welatên cîhanê de jin heya redeyeke berçav gihîştine mafên weheviyê û hikûmet û yasa îznê nadin ku mafê jinan bihê binpîkrin. Lê belê li gelek welatên cîhanê de, mixabin hêj jî jin û mafê jinan tişteke tabo ye û civak, ayîn, malbat, yasa û hikûmetê bihevre dest dayne ber çavên xwe û tiştek binavê pirsa jin nabînin û naxwazin bibînin Jî. Gelek welatên Afrîqa, Asiya, Amerîkaya Latîn û Rojhilata Navîn li wê katogoriyê de ne. Li welatên skandînavî de, mirov mafê wekhev li Yasaya Bingehîn, yasayên medenî, organên biryarder û hemû dem û dezgehên dewletî û prîvate de dibîne û ji ber wê ye ku ew welatane li warê civakî, asayişa civakî, azadiya raderbirînê, civaka pêşketî, abûriya welat, mafên tekekesî, perwedeya durut û zanistî, demokrasî û çend destkevtên din li cîhanê de bi nav û deng in. Lê mixabin li welatên paşketî yên Afrîqa, Asîya û Rojhilata Navîn de, jin hêşta basê mafê dengdan, perwerde, kar, hatuçû, cil û berg û gelek mafên herî sereke yên jiyanê dikin. Li wan welatan de Yasa, Ayîn, Kultur û civak pêşî li hemû mafên jiyanê ji bo jinan digrin.

Mixabin em jinên kurd jî li hemû parçên Kurdistanê de, kêm yan zêde ji gelek mafên jiyanek serbest û azad bêpar in. Li Başûrê Kurdistanê ronahiyek kêm li halê geşbûnê de ye. Û bi hemû hêza xwe li gel mîrên femînîst, xebata ji bo mafên wekhev dest pê kirine. Lê Prosesek demdirêj e û hewce ye ku civak, hikûmet, dezgehên dewletî û organên pêwendîdar bi jinan hemû bikaribin vê xebatê bihevre pêşve bibin û li vê derheqê de zêde kar li ser hişyar kirin û perwerdekirina Civakê bihê kirin. Li Îranê de ji berku hikûmetek dijî kurd û dijî jin li ser kare, jinên kurd du zulman dikişînin. Yek zulma netewî û ya din steme cinsî. Lewre jinên kurd niha her du xebatan him ji bo rizgariya netewî û him jî bona mafê wekheviyê bihevre dimeşînin.



Xebatek ku heya niha nirxek yekcar zaf daye, lê carê bi armanc negihîştiye.

8'ê Adarê, roja berxwedanê ye, Roja hevpêwendiya Cîhanî a jinan dijî zulm zoriyê ye, roja rêzgirtin ji xebat û tekoşîna jinan e, roja hişyar kirina jinan bo mafên wekhev e û wekî gelek rojên din yên dîrokî bi xwîn û kedekî zaf hatiye tomar kirin. Lewra Pêşketina her welatekê girêdayî bi mafên wekhev li navbera jin û mêran de ye. Li vê derheqê de Xebat ji bo mafên wekhev, erkek e ku dikeve ser milê herdu regezan. Jin û mêr bi hervre girêdayî ne. Her du bihevre jiyanê dikemilîn in. Bi wateyek din ne jin bê mêran dikarîn bijîn, ne ji mêr dikarin bê jin bijîn. Lewre cîhan ya me hemûyan e û me hemûyan jî ev mafe heye ku bi serbest bijîn.

## Xwekuştina sê jinan di kurdistana Rojhilatê de



Li çend rojên borî de, di bajarê Merîwan û Sine de sê jinan xwe kuştin. Malpera "HARANA" di vê derbarê de ragihand, roja 10'ê Şibata 2010'an, kesek bi navê Mêhrane Şerîfî xelkê bajarê Merîwanê, bi sedema pirsgirêkên civakî bi awayê, daliqandî xwe kuşt. Tê zanîn Mêhrane di sala borî de jiyana hevbeşî pêk anibû.

Wê çavkaniyê herwiha da zanên, roja 18'ê Şibata 2010'an kesek bi navê Vîda Ezîziyan, xelkê bajarê Sine, ku heftiyek berî niha, bi sedema pirsgirêkên malbatî xwe şewtandibû, bi sedema bandor bûna şewtînê di nexweşxaneya Bêseta bajarê Sine de jiyana xwe ji dest da.

Herwiha jinekî din bi navê Reina xelkê Tazawaya bajarê Ciwanro ku xwediyê heft zarokan e, agir ji canê xwe berda, bi wê sedemê jiyana xwe ji dest da.

## Strês, pirsgirêkeka mezin a jiyana nûjen e



Stres tê wateya "giraniya borandina jiyanê". Di jiyanê de hêz û giraniyeka her tiştî heye. Di kargehê de, di têkiliyên mirovan de, di malbatê de hwd jiyan xwedî tempoyek e.

Ev tempoya han, hin caran zora tempoya mirov dibe û mirov xwe di bin giraniyê de hîs dike. Ew e. strês. Strês herçendî negatîv, ew çendî jî pozîtîv e. Stres mirov ditetikîne ku mirov karê xwe di tempoya jiyanê de bike û biser bikeve. Her mirovek xwedî toleransek e. Hin kes zû dikevin strêsê, hin jî dereng an kêm. Strês xwedî vizyonên biyolojîk, psîkolojîk û fîzyolojîk in. Li ser fîzyolojiya strêsê, gelek xebat hatine kirin. Dema organîzmaya mirov bikeve xetereyekê, yan bar giran bibe, organîzma dikeve alarmê. Bi her aliyê ve berpêyên xwe nîşan dide. Organîzma dixwaze û lêdigere ku serî bi vê rewşa nû re derîne, dengeyekê ava bike. Helbet organîzmaya her mirovek gorî taybetiya xwe reaksiyon dide. Heger organîzma serî bi vê rewşa nû re derneyne, ango strês zora mirov bibe, ziyanê dide. Ziyan xwe bi her alî ve dide der. Hin cureyên sîmptomên psîkosomatîk ji ber strêsê ne. Herwekî strêsa mezin ziyanên biyolojîk, fîzyolojîk û civakî didin. Pispor di wê baweriyê de ne ku, jiyana nûjen û tempoya wê gelek ziyanan dide mirovan. Mirov dikare bêje stres, pirsgirêkeka mezin a jiyana nûjen e

Lê strês kêm be jî, divê hebe. ji ber ku strêsa kar û xebatê alîkariya serkeftine jî dike. **HAWAR NET**

www.arsivakurdi.org

# Du Îranî Û Pênc Îtalî Bi Tawana Qaçaxa Çekan Bo Îranê, Hatin Girtin

Dozgerekî dijî terorîzm li Îtaliyayê, roja çarşemî, 03.03.2010'an ragihand ku du Îranî û pênc Îlatî bi tawana qaçaxa çekan û binpêkirina dorpêçên navnetewî derheq Îranê, hatin girtin.

**Armando Spataro,** dadistanê dijî terorîzma Îtaliyayê, di konferansek çapemeniyê de ragihand seba vê yekê ku pirsa han di asta navnetewî de girîng e, lêkolîn di vê derbarê de xwedî bihayek pirr mezin e.

Di vê pêwendiyê de Serheng **Wînçinzo Andirune,** got: Wan kesan dixwastin hejmarek zaf ji mûşekên dijî Tang û madeyên teqîner bişînin Îranê.

Pêka vê raporê, **Hemîd Meisûmî Nejad**, 51 salî yek ji girtiyan e ku xwe wek rojnamevan daye nasandin û akinciyê Romê ye. Herwiha Humayûn Bextiyarî, yekî din ji girtiyan e ku karê xwe îlan nekiriye. Li gor rapora berpirsên Polîsê vî welatî, ev du Îranî tevî pênc Îtaliyan, di bajarê Torîna a Îtaliyayê de hatine girtin.

Wînçinzo Andirune, derheq şûnasa girtiyan dibêje: Pênc kesên Îtalî, birêveberên şîrketên hinartin û anînê û herwiha şîrketên moxabiratî ne.

Dewleta Îranê heya amadekirina vê nûçeyê, derheq girtina 2 Îraniyan û herwiha tawanên lêdayî bi wan, tu helwestek negirtiye.

**Kongireya Netewên Îrana Fedral:**

# Siyaseta zimankujiya Şowenîzma hêjmûnîxwazî, dijî netewên Îranê bi tundî dom dike.

Kongireya Netewên Îrana Fedral di daxuyaniyekê de bi hilkevta roja cîhanîî ya Zimanê Zikmakî ragihand, di dema desthilatdariya Şowenîzma hêjmûnîxwazî ya zimanî, çandî û siyasî de, li Îranê de siyaseta zimankujî û çandkujî bi awayeke bername dijî netewên Belûç, Turk, Kurd, Ereb, Turkemen, lor û... bi dijwarî dom dike.

Kongireya Netewên Îrana Federal, tevî Şermezarkirina siyaseta jînosayda aram ji aliyê şowenîstên desthilatdar, radigehîne ku Çavnihêriya hevşêwe ji tewahiya azadîxwazan, yeksanîxwazan, rewşenbîran û çalakên siyasî yên Îranê bo şermezarikirina wê siyasetê heye.

Kongireya Netewên Îrana Federal, herwiha piştgiriya xwe li pêkanîna xwenîşandanan di kom û civînên giştî yên navnetewî de bo haydarkirina xelkê cîhanê li hember binpêkirina wî mafê sirûştî "xwendin bi zimanê zikmakî" yên zarokên ne fars ji aliyê Îraniyên derveyî welat ve ragihandiye.

# Xelatên Oscarê 7'ê adarê dê di merasîmekê de bihên eşkerekirin.




Xelata Akademiya Fîlman a Amerîkayê Oscar, dê ew berhem û hunermendên ku hêjayî vê xelatê hatine dîtin, li Şanogeya Kodakê ya Los Angelesê di merasîma 8'emîn, bi pêşkêşiya Steve Martin û Alec Baldwin, bêne aşkerekirin.

Oscar, ji aliyê akademiya Huner û Zanistên Sînemaya Amerîkayê ve tê belavkirin. Xebatên amadekariya wê, li ser malpera wê ya resmî û malperên sektora sînemayê saet bi saet tête ragihandin. Şeva Yekşemê dê merasîma "82'emîn a Xelatên Oscarê", ji aliyê televizyonên çar aliyê dinyayê ve bi zindî bête weşandin.

Hate zanîn, bo çêkerê fîlmê Nicolas Chartier ê ku bi fîlma "The Hurt Locker" ji 9 beşan de wek berendamê Oscarê hate nîşandayîn, saziya Oscarê qedexe danî.

Li gorî nûçeya malpera "news.softpedia.com", ji ber ku Chartier ji endamên akademiyê re bi riya e-postayê gotiye, "Dengê xwe bidine me" ev qedexe jê re hatiye danîn.

**AKnews**

*Kaniya Helbestan*

# Pêşmregê Viyanê



**Bêhzad Simko**

Ev destê min dûre ji destê Viyanê
Bi hawar û qîrîn viyana min kanê
Ji derd û kul û êş ez nebûm yê manê
Hey dilê reben ev dildara te kanê
Wir min Tifeng helgirt ser xwemanê
Rêya viyana min, doza Kurdistanê
Ezê peyda kim derdê xwe ra dermanê

Heta peyda kim destê eşq û jiyanê
Ber viyanê, ez Pêşmergê Kurdistanê
Heta hebe xwîn li ra û ruh ber manê
Wextê peyda bû roja geşa viyanê
Viyan, hate destim ser Kurdistanê
Viyan û evîn tek eşqa kurdistanê
Zagros, mêrxwaze ser welat nav meydanê
Hezar! Sale ber kurdistan nav meydanê
Şere tek, ser şerefa axa goristanê
Viyanim! Canim feda be bo kurdistanê

Ey Viyan! Tu eşqa minî ez heyranê
Ezê te xilas kim; ey cane civanê!
Tek tu kurdistan! Ya minî ey viyanê
Navê te, her tim, şev û roj, ser zimanê

Her kes ku heye evîna kurdistanê
Hezar-hezar ji stêrkên nav esmanê
Çav lêdidin tenê li ser eşqa viyanê
Viyanê! evîndarê te li zîndanê
Ji evîn ev ber dujmin serî nadanê
Evîndarê te li zîndan ser darê îdamê;
Ber eşqa te zor geşe û lêv xendanê
Hinek Şehîd û hinek ji berxwedanê
Ji evîna te ra mirin; kurdistanê!
Zagros, ser eşqa viyanê çû zîndanê
Çûye rêya merg û nemanê ber viyanê

www.arsivakurdi.org

# Kurte Hevpeyvînek Bi Herdu Hunermendên dengxweş: Şervan Û Erefat Re

**Hevpeyvîn: Cefer Mubeşirniya**

**Bi hilkevta roja evîndaran(14/2), li ser gaziya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê, du hunermendên ciwan û dengxweş ên Kurd li Bakûrê Kurdistanê bi navên Şervan û Erefat, kunserek li bajarê Koyê (Kurdistana Îraqê), lidarxistin. Hejmarekî berbiçav ji heyran û hezkiriyên dengê wan li kunserê de beşdar bûn û bi stran û dengê zelal û xweş yên xwe, germahiyek taybetî dan kunserê û beşdar û heyranên xwe jî ecibandin. Her çiqas ku dema wan hindik bû, lê Duheftenameya Agirî ew derfet bi girîng zanî ku heger bi kurtî jî be, çend pirsiyaran arasteyî wan her du hunermendan bike. Bona wê ku him rêz ji huner, ked û mandîbûna wan bigre û wekî erk bi nisbet dengxweş û hunermendên xwe emegdar be, him jî wan zêdetir bi xwandewanên xwe bide naskirin û ji vê riyê ve jî xizmeta wan bike. Wan birêzan jî herçiqas ku kêmasiya demê hebûn, lê dîsan bi dilgermî ve daxwaza me pejirandin û bi kurtî bersiva çend pirsiyarên me dan. Deqa axaftina me li jêr de dikeve ber çavê we xwendevanên hêja!**



**Berî her tiştî em bixêrhatina we bo Kurdistana Başûr dikin Û dixwazim ku Hunermend Erefat ji zarê xwe ve bi xwendevanên Agirî re bidim naskirin, keremke?**

Belê di pêşiyê de ez spasiya we dikim û keyfxweş im ku niha ez li Kurdistana azad deme. Ez stranbêj Erefat, li sala 1973'ê Zayînî de li Kurdistana Bakûr li bajarê Wanê, devera Qelqeliyê û li gundê Sedmasê ji dayîk bûme. Min li biçûkatiya xwe de hez ji mûzîkê kiriye û wê demê min stran li radyoya Êrîvanê de guhdarî dikirin û ji hemûyan bêtir jî, min ji hunermendê bi nav û deng Şivan Perwer hez dikir. Li rastî de stranên wî tesîr û bandorek pir mezin li ser min kir ku ez dest bi hunera stranbêjiyê bikim, her bi wê evînê, min ji stranên şorşgerî hez kir û niha jî jê hez dikim û weke karek hunerî ji bo xizmet kirin bi hunera kurdî û pêşxistina çanda kurdî min şopandiye û dişopînim.

**Herwiha hunermend Şervan, em bixêrhatina we jî dikim û dixwazim ku hûn jî bi kurtî xwe bi xwendevanên me re bidin naskirin.**

Ez jî her mîna hevalê xwe gelek keyfxweş im ku niha li wirim. Ez jî hunermend Şervan, li sala 1984'an li devera Xoşebê li gundê Paçanê ji dayîk bûme û min ji zaroktiya xwe de ji hunera stran gotinê hez kiriye û bi guhdarîkirina hunermendên birêz ên Kurd û ji wan jî, dengê hunermend Kazo pir hez dikim û bi wî awayî dest bi hunera stran gotinê kir û huner û sitrana kurdî yê bûye parek ji evîn û heviya jiyana min.

**Gelo Hunermend Erefat heya niha xwediyê çi berheke ye?**

Min heya niha çi albomek çênekirye, lê min li kanalên herêmî de kilîp çêkirine û dihên weşandin, lê eve cara yekimîne ez dihêm başûrê Kurdistanê û kar dikim jibo çêkirina albomekê .

**Kek Şervan çi bû sedem ku hûn stayleke resen a stranên Kurdî hilbijêrin? Gelo we heya niha çi berhemek derxistiye yan na?**

Armanca min ew bû ku bi guharîn û dest pêkirin sitaylek nû bikarim evînî û hugiriyek zêdetir ji nava dilû guhdarên dengê Şerwan û pêşxistina hunera kurdî çê bikin.

Her bi vê staylê jî, li sala2007'an de albûma min a yekemîn derket û ji strana xwe ya bi navê Semê re, min kilîp çêkir. Her wiha sala2010'an de min albomek din bi navê "Min bihstî tu poşmnî"amade kirye.

**Kek Erefat hûn bi çi staylekê stran dibêjin?**

Min jî bi mûzîka resen a Kurdî dest pêkiriye, lê piraniya stranên min şorşgerî ne û bi rastî di Qonaxa niha ya tevsera rizgarê xwaz a gelê kurd de û xebata Şorişvanî û birûmet a xurtên me ew stran pêwîst in û cihê taybetî yê xwe heye.

**Kek Şervan bi baweriya we bandora mûzîka netewên hakim bi ser Kurdistanê de li ser mûzîka kurdî li her parçeyên Kurdistanê heye yan na?**

Zimanê Kurdî her yek e û herçiqas ku Zarawên cur bi cur hene jî, lê bi rastî jî ew tesîr li ser mûzîka Kurdî heye û mixabin her ku diçe, ew tişt zêdetir jî dibe.

**Kek Erefat çima te stranên şorşgerî gotin?**

Birastî her tiştek ji pêş çavên mirov e û ew bûyerên çêdibin em dikin sitran, tiştek zêde em nabêjin, xêncî rastiyan ku bi bawera min em bi heq dibêjin ew jî nîşana wê yekê ye ku stranên şoreşvanî heya niha jî zindî ne û ji bo gelê me hewce ne, ji berku gelê me carê li xebata bo destveanîna maf û azadiyên xwe de ye. Hêj em tên tepeser kirin, çimisandin, neheqî li me tê kirin. Bi giştî stranên han hesta netewî geştir, bihêztir û kurdan hişyartir dikin. Lewma ez him wekî hez û elaqeya xwe û him jî wekî erk wan stranan dibêjim.

**Kek Şervan raya we li ser stranên şoreşvanî çiye di dema niha de?**

Eva rastiyek e ku berê medya u ragihandin tunebûn û her tiştek di dîroka me ya siyasî de ji riya stranên şoreşvanî ve dihatin guhdarîkirin. herçiqas niha medya û ragihandinên Kurdî hene, lê heya niha jî gelê me bindest e, lewma ji bo wan medyayan jî û bi giştî bo gel jî stranên şoreşvanî pêwîst in û niha jî bandora erênî ya xwe hene.

**Kek Erefat her çend ku gelek pirsiyarên min hene û dixwazim bersiva wan bizanim, lê jiberku hûn gelek bilezin, dixwazim li derfetek din de zêdetir we li ser huner û mozîka kurdî bînim ziman. Lê ger we gotinek hebe?**

Spasiya we dikim, herçend ku min jî pê xweş e zêdetir li xizmet we û xwendevanên Agirî de bim, lê dema ku hûn hatine, ne munasib e û hûn dibînin ku em mijûl in. Lewre em daxwaza lêborînê ji we û xwendevanan dikin. Îşala emê li derfetên din de bêhtir bihev re bipeyvin.

**Kek şervan eger we jî gotinek hebe?**

Em li ser daxwaza Yekîtiya ciwanên Demokrat ên Kurdistana Îranê deiwetî vir bûn, gelek spas ji bo wan û herwiha spas jibo we xebatkarên Agirî re.

# Şiroveya Gotinên Pêşiyan

**Beşa 11**



## Çiya Mazî

*"Ji ber ku peyv kêm hatine bikaranîn nayê fêmkirin. Eslê wê ev e; 'Destê pîsîtiyê bide, wê bi rûyê xwe were'. lê ev ji kêm e. Bi baweriya min wê wiha hatibe gotin. ' yê bi destê xwe têkeve pîsîtiyê wê rûyê wî jî têkeve nav' e. Ji xwe wateya wê ji ew e, ku hinek bi destê xwe an bi hindikî têkeve nav karên xerab, demek din bi hertiştî xwe dikevê û êdî nikare xwe jê xelas bike. Bi hindikî destpê dike lê dû re nikare xwe xelas bike , bi pirî ve dihere.( Ç.Mazî)"*

**1.** " *Dinya ji kesî re nabê yar" û "Herkes li benda xwe disekine*" ev jî ne gotinên pêşiyan ne. Metelok (Ozdeyiş) in. "Nabê" jî nin e. Gere "nabe" bit. Rastiya gotina duyem jî " Herkes li benda roja xwe ye" (Q Dêrsilavî)

"Hinek gotinên pêşiyan henin ku di nava ferhengê de jî pir in, wekî tasavufî tê dîtin. Û dibe ku bi wî awayî jî hatibin gotin. Lê bi sedsalan hatine gotin û êdî ji oldarîyê tasavufiyê derketine, di nava mirovan de bi wate û ji bo tiştine din jî tê gotin. Ev gotina bi oldarî li ser dinyê hatiye gotin, ku wekî 'mirov giş dê bimirin' in. lê êdî ji bo gelek tiştên din tê gotin. Mînak ; ku hinek milkekî mirov bixwin an bi darê zorê ji mirov bistînin jî, mirov dibêje' dinya ji kesî re nebûye yar'. An 'dinya ji kesî re nemaye'. Ji ber wê yekê jî, gotinên wiha êdî bûne gotinên pêşiyan. Lê dibe ku li nava gelek netewan bêne bikaranîn. Ev jî tiştekî xwezayî ye. Lê li nava her neteveyekê bi awayekî din têne gotin. Ev jî wekî Brêz Dêrsilavî jî di şîroveya xwe î serî de bahs kiriye ku gotinên pêşiyan hinek jê dibe ku navnetewî bin. Ew dibe malê çend neteweyan.(Ç.Mazî)"

**2.** ""*Kêmaniya kesekî ji kesî re nabe kêmanî*" Yanî çi? Gelo hûn karin çi wateyê li vê gotinê kin? Gotin hatiye guhestin. Gelo ne "Tunebûn ji mêran re nabe kêmanî" be.(Q.Dêrsilavî)

*"Ev gotin berevajî gotina 'Golikek nayê garanekê xera dike' ye. Ku mirovek çi dike ji xwe re dike, kêmaniya wî ji wî re ye. Nikare xisarê bide hinekî din. Carinan li gor rewşê, gotin berevajî hevdû hatine gotin. Mînakên wiha jî pir in.(Ç.Mazî)"*

**3.** *"Kesê pişta wî tunebe, serê wî tim tewandî ye"* Ez bawerim ku em vê goitinê jî têxin sitûyê pêşiyan, dê di xew de marê wan were me. Gelo hûn karin herêma vê gotinê beyan bikin. Min tiştek wiha bihîstî ye: "Li zik xistine, gotiye ay pişta min." Ev jî dibe biwêj ne gotina pêşiya ye. (Q.Dêrsilavî)

"*Lê hin biwêj hene bi formekê dibin biwêj û bi formekê dibin gotinên pêşiyan. Wekî me di şîroveya nivîskar de jî diyar kiriye ku hinek gotin di navberê de jî dimînin. Brêz Dêrsilavî ji vana re gotiye "metelok(özdeyîş).Mijara herêmê jî, ne gengaz e ku mirov gotinên pêşiyan yên li herêmine din bê gotin, bibihîze. Li herêmeke din, dibe ku bi awayekî din bê gotin. Ev jî xwezayî ye. her du gotin jî ne wekî hev in, wateya wan ji cûda ye. (Ç.Mazî)"*

Ti pêwendî di navbera "Kesê pişta wî tunebe, serê wî tim tewandî ye" û "Li zik xistine, gotiye ay pişta min." de nîne. Her yek tiştekî din e. Gava mirovek bêkes be, dê her kes zorê lê bike û serê wî bitewîne, lê gava ne bêkes be, ti kes nikare zorê lê bike. Ez gotina jorîn bi vê maneyê fêhm dikim. Gotina din bi temamî tiştekî din e. (M. Reşîd).

**4.** "*xwesara kesî di ronahiyê de çê nabe*" Gelo biyaniyan gotin nivîsî ne? Ne min tiştek jê fêm kir ne jî texmîn. (Q. Dêrsilavî)

*"xweserî, wekî xwerû bûn e, an azadî ye. Wekî dibêje, 'azadiya kesî bi xweşî nayê' ye. ev yek jî gotinê li rastiya xwe disekinîne û bi ya min rast hatiye gotin lê dîsa mirov bi qutebirî nikare bibêje wiha ye.dibe ku 2 xweser bi wateya "xisar" jî hatibe gotin. (Ç.Mazî)"*

Ez tiştekî din jê fêhm dikim. Ez bawer dikim, ku "xwesar" ji gotina erebî "xesar" yanê "zirar" hatiye. Hîngê "Zirara kesî di ronahiyê de çênabe" tê wê maneyê, ku gava pirs û mijar zelal bû û her tişt derket meydanê, rastî tê xuyakirin û di rastiyê de mafê kesekî nayê xwarin. (M. Reşîd).

**5.** "*Bi hevalê xwe neken, wê were serê te jî*" Ev jî ne gotina pêşiyên Kurdan e. A pêşiyên Tirkan ku "Gülme komşuna, gelir başına" û a pêşiyên Eraban e, ku orjînala wê jî "Men deqe, duqe" ji xwe beyan e, wate xweş be jî, gotinên wê bê sir in. Belkî bi Kurdî jî hebe, lê ne bi vê formê. (Q.Dêrsilavî)

**6.** *"Hilneweşîne, wê hilweşînin"* ez baş dizanim ku ev jî malê netewên biyanî ne. Qey gelo di zimanê xwe de kêmanî didît. Gotinên pêşiyên Kurdî têra vî çend rupelkê we nedkir? (Q.Dêrsilavî)

*"Rast e, herdu gotin jî dibe ku ji netewên cîran hatibin, dibe ku yên pêşiyên Kurdan be jî û dû re gelên din gotibin , li wir jî hatibin gotin. Ev rewş ya sedên salan e. Ji ber wê yekê jî tiştekî xwezayî ye. Ne hewceye ku mirov ji bo gotinên wiha pir qutebirî helwestê deyne.( Ç.mazî)"*

Ez ne ji vê baweriyê me, ku gava gotineke mîna vê li ba gelên din hebe, hîngê ew ya wan e. Li gor logîk, di rewşeke wilo de, sê îmkan hene:
dibe ku wan ji me biribe,
dibe ku me ji wan biribe,
dibe ku rewşeke wisa peyda bûbe, li ba me jî ( bêyî bandora wan ) û li ba wan jî (bêyî bandora me) ev gotina hatibe afirandin.

Gelo çima em li vir hema tenê îmkana duyem distînin û bawer dikin, ku ev gotin ya gelên din e? Ma ne ev ji kêmbaweriya me bi çand û kelepora me tê?

Ev gotina jorîn ya duyem, li herêma me jî heye û bi vî awayî tê gotin:

"Bi hevalê xwe mekene, ê were serê te jî". Baweriya min jî, li vir, wek ya Ç. Mazî ye.
(M. Reşîd)

**7.** "*Kar bi taxpaşkirinê pêk naye*" (?) Gelo kê ji vê çi fêm kir. Min gotineke weke "Gayê texbeşo" bihîstî ye. Lê ez bawerim ew jî biwêj e. (Q.Dêrsilavî)

*"Taxpaşkirin di vê derê de wekî ku ji peyva "dabaşkirin"ê hatiye. Wekî ku mirov dest bi karekî bike, pêşî mirov dabeş bike an par bike, lê piştî wê divê mirov dest bi kar bike û biqedîne. Bi dabaşkirinê tenê çênabe. Wateyeke din li herêma torê tê bikaranî jî ev e(bi baweriya min a rast jî ew e) 'Kar bi taxpaşkirinê pêk nayê', wekî kar ne ew tişt e ku tenê mirov taxan li paş xwe bihêle û bibêje kar xelas bû. Ango, divê mirov bi bingehîn û zexm kar bike, herwiha ev gotineke pêşiyan e û darizandin û hukum tê de heye. (Ç.Mazî)"*

Pirsgirêka vê gotinê di "taxpaşkirinê" de ye. Gelo ev bi rastî ji bêjeyên "tax" û "paqişkirin" pêkhatiye?. Heke wisa be, hîngê şîrovekirina birêz Çiya Mazî rast e. Lê bi dîtina min, bi gelemperî mijara "Gotinên Pêşiyan" ne pirseke ewqas rihet e. Ez bi xwe vê gotinê nas nakim. Divêt mirov bipirse, ka gelo ev gotin ji kû hatiye û li kîjan herêmê tê gotin û hîngê ji wan bipirse, ka mebest ji vê gotinê çi ye? Dibe ku mebest tiştekî din be jî. (M. Reşîd)

**8.** " *Kes ji ber malê xwe ne ketî ye şerê me*" tu wate têde nîn e. Min ev bihîstî ye "*Kesî ji ber malê xwe neda ye kerra, berra*" Yanî kesî malê xwe ne avêtiye, terka wî ne kiriye. (Q.Dêrsilavî)

*"An 'kes ji ber malê xwe neketiye şerê kesî' ye. An forma ku em dibêjin dibe gotina pêşiyan jî ev e "Kes ji ber malê xwe nakeve şerê kesî" gotinên pêşiyan jî li gor herêman têne guherandin.( Ç.Mazî)"*

Ev jî we ya jor, divêt mirov bipirse, ka ji kû hatiye û mebest jê çi ye? Dibe ku bi vî awayî be jî: "Ew li dij me derdikevin, ne ku zirarek gihîştiye malê wan yan tiştekî wisa, mesele tenê dexsî û hesûdî ye". Lê ev texmîn e, ez rastiya wê nizanim. (M. Reşîd)

**9.** "*Kesê çavbirçî, kerê bi bar ve dadibelîîne*" rastiya vê jî wiha ye û biwêj e: "Weke gurê çavbirçî, kerê tevî bar dadibelîîne". (Q.Dêrsilavî)

*"Wekî berê jî me gotibû bi hin guhertina forman ,biwêjek dikare bibe gotineke pêşiyan û bi demê re wiha bûye. Wekî vê gotinê jî , dema ku mirov peyva 'kesî' bikar neyne û 'weke' bikar bîne, dibe biwêj, ji ber ku mirov rasterast ji yekî re dibêje. Lê heke wekî peyva 'kesê' hebe tevahîbûn çêdibe û darizandin, pendîbûn û hukum ji her kesî re çêdibe. Dema tenê " kerê bi bar dadibelîîne" be . dibe biwêj.( Ç.Mazî)"*

Peyva "dadibelîîne" peyveke erebî ye, kurdiya wê "dadiqurtîne" ye. Li ba me biwêjeke mîna vê heye. Dibêjin: "Hêştir tev hawid dadiqurtîne". Ev ji kesekî re tê gotin, ku polperest û diravperest be, tenê kelk û mesleheta xwe dizane, hema çi keys û fersend ketê, her tiştî ji xwe re dibe, hesabê kesekî din nake. Ez ji biwêja jor jî vê maneyê fêhm dikim. (M. Reşîd)

**10.** "*Wextê bira bira be, jina birê mehr nake*" çi têkiliya vê û gotina pêşiya bi hev heye. Bi texmîna min vê gotinê Mahsum Qirmizîgul, di 1999 de derxistiye (qerfe) (Q.Dêrsilavî)

*" li gor ku min lêkolîn kiriye û bi baweriya min ev ji berê de heye. Wekî dibêje 'bira xêra bira bixwaze, jina wî mehr nake'. Lê dibe ku hinekî hetibe guhertin. (Ç.Mazî)"*

Dîtina min jî li vir wek ya Çiya Mazî ye. (M. Reşîd).

**11.** "*Esil winda nabe*".Tu têkiliya vê gotinê bi pêşiya re nîn e. (Q.Dêrsilavî)

*"Bi baweriya min wekî 'esalet winda nabe' ye,. Esaletî jî di demên berê de bandorek wê hebû, ji ber wê yekê jî û ji ber ku hukum jî heye gotineke pêşiyan e, (minak dibêje 'ev tiş wiha nabe'). Herwiha ji bo "esil" jî bê gotin dihere ser heman wateyê. Esalet bi xwe jî ji bingehê tê ji "esas" tê, "esas" jî nêzî "esil" e ango "jêderk" e. ( Ç.Mazî) "*

Ez jî wek Çiya Mazî "esîl û fesil" jê fêhm dikim. Ev ji berê de heye. Gava kesek tiştekî xirab û nebaş dike, dibêjin "Ew bê esil û fesil e" yan jî "Şîrê wî ne paqij e". (M. Reşîd).

**12.** "*Zêr zingar nabe*" Rastiya wê "Zêr di ku keve, zingar nabe" ye.(Q. Dêrsilavî)

*"Zêr zingar nagire" bes e. Lê bi guherandina formê an li hin deveran bûye "zêr di ku keve zingar nagire" ev jî tiştekî xwezayî ye..(Ç.Mazî)*

agiri

Duheftînameya siyasî, civakî, çandî û hunerî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: agiri2003@hotmail.com
agiri2003@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com



## Biryarek dîrokî: Tawana Helepçeyê Bi Jînosayd Hat Nasın



Dadgeha Pêdeçûnê ya Iraqêö tawana kîmyabarana Helebçeyêö bi Komkujî (Jînosayd) da zanîn. Biryar bi piraniya dengên dadveran bûye. Herweha biryar e ew tawan li madeya 12'a Yasaya sala 2005'an a dadgeha Bilind ya Iraqê de ku li dijî mirovahiyê dabû nasîn, bo madeya 11 ya wê Yasayê ku tawan bi jînosayd da nas kirin, bê guhertin.

Piştî 37 rûniştinan bo dosyeya Helebçeyê, dadgehê di 17'ê Rêbendana sala 2010'an de biryara darvekirinê bo tawanbar Elî Hesen Mecîd, derkir û li 25'ê Rêbendana 2010'an de jî ew darvekir. Weka tê zanîn Helebçe li sala 1988'ê ji aliyê Balafirên Artêşa wê demê ya Iraqê ve bi çekên Kîmyayî hat bombebaran kirin Ku di encam de 5 hezar şehîd û 10 hezar jî birîndar bûn û hejmarek zarok jî di wê bûyerê de winda bûn û heya niha jî malbatên wan li pey wan digerin.

## Uslo Li Hember Tehranê Sekinî



Dewleta Norwejê li hember biryara Komara Îslamî di pêwendî digel derkirna Balyozekî Norwejî ji Tehranê, biryara derkirina balyozekî Îranî li usloyê da.

Sedema derketina aloziya han di navbera rejîma Tehranê û Dewleta Usloyê, vedigere ser vê yekê ku Norwej penaberiya siyasî daye **Mihemedreza Heyderî**, endamê berê yê balyozxaneya Îranê di wî welatî de. Mihemedreza Heyderî, piştî tepeserkirina hovane a xwenîşandanên Îranê ji aliyê hêzên rejîma desthilatdar di roja Aşûrayê da, dest ji karê xwe kişand û ragihand ku ji niha vir ve dê xebatê ji bo mafê mirovan û azadiya girtiyên siyasî yên Îranî bike.

## Keçek Kurd Bi Destê Hêzên Komara Îslamî Hat Kuştin

Li gor nûçeyê ku li bajarê Bokanê hatiye zanîn Gulçîn Salihpûr keçek 22 salî li malbatek feqîr û hejar a pişttepe a bajarê Mehabadê, ku di girtîgeha bajarê Bokanê de destbiser bû, bi egerek nediyar ji aliyê hêzên mirovkuj ên rejîmê ve hat kuştin.

Gulçîn Salihî di wan heyamên girtîgehê de berdewam di bin îşkençên nemirovane ên hêzên rejîmê de bûye, û egera wê yekê heye ku di bin îşkençê de canê xwe ji dest dabe. Hêjayê gotinê ye ku memûrên rejîmê bi bê haydar kirina malbata Gulçînê, ew li cihek nediyar veşartine û tenê bo demek kêm, îzna dayka wê dane ku keça xwe bibîne, herwiha hêzên Îtilaatê gef ji dayka Gulçînê xwarine ku nabe bi çi awayekê bas ji nûçeya kuştina keça xwe bike.

## Newroz bû rojek fermî a Cîhanê



Koma Giştî a Saziya Netewên Yekbûyî, roja 21ê Adarê, yekemîn roja newrozê weke "Roja Navnetewî a Newrozê" binav kir.

Koma Giştî a Saziya Netewên Yekbûyî di civîna xwe a roja sêşemî, 23.02.2010'an, biryarnameyek di vê pêwendiyê de derkir ku têde hatiye: 21ê Adarê hevdem e tevî destpêka demsala Buharê û ji pitir ji 300 milyon kesan ve li sernaserê cîhanê de weke yekemîn roja sala nû tê pîrozkirin.

Civata Giştî a saziya NY herwiha daxwaz ji endamên xwe kiriye ku ji bo vê rojê xwedî pilan û bername bin.

## Turk û Baydemir derketin TRT 6'ê



BDP'ê sansûra li hember TRT Şeş'ê da aliyekî. TRT Şeş'a ku ji destpêka xwe ve heta niha ji aliyê BDP'ê û PKK'ê ve laqayî protesto û amborgoyan bûbû, di dawiya dawiyê de Ahmet Türk û Osman Baydemir da axaftin.

Ehmet Türk û Şaredarê Amedê Osman Baydemir, bo berhema şanoyî ya Haldun Dormen a bi navê "Çîrokeke Zivistanê"daxuyaniyên bi kurdî yên taybet dan TRT Şeş'ê û di nûçeyên êvarê de hat weşandin ku weha bûn: Ehmet Türk: "Heger çandên li ser van axan, hevûdin nasbikin, wê pir baş bibe. Wenda bûna çanda kurdî, wê zerarê bide çandên din jî. Çand, tu caran nebûne dijminên hev." Osman Baydemir: "Di dîroka Tirkiyê de eve cara yekemîn e ku bi hesteke weha xweş çanda me hatiye ser sehnê. Bi vê yekê, di navbera çanda Kurd û Tirkan de pirek çêbû ye. Ez di wê baweriyê de me ku, bi vî awayî qeşemên di navbera çand û zimanan de heyî, dest bi helandinê kiriye. Ez wusa difikirim ku biharek nû dest pêkiriye û ji vê yekê bi hêvî me." **Rizgarî**